Dema ku berê şoreşê danc çekdariyê û ew li heza rêjîmê û hin dewletên herêmê jî hat, ji ber ku wê rê li pêş rêjîmê zêdetir vekir, ku hemû çekên xwe bi kar bîne û bi kîndariyeke pirtir hemû deverên ku tevlî şoreşê bûne bombebaran bike. Ew li heza hin dewletan jî hat, ji ber ku çekdarbûna şoreşê hîşt deriyine pirtir ji destêwerdanê re vebin, û bi wê destêwerdanê belkî karibin hin berjewendî û armancên xwe yên taybet di herêmê û li derveyê herêmê jî bi cî bikin. Di destpêka çekdariya şoreşê de, tevgera rêzanî ya Kurdî nêrîna xwe diyar kir û got: Berê şoreşê hate guhartin. Sûriyê ji şoreşê derbasî kirîzeke dirêj bû, û ev yek dê bêle ku temenê rêjîmê dirêj bibe, demê jî teqez kir, ku ew nêrîneke rast bû.

Piştî ku tevliheviya çekdariyê li serûberê Sûriyê çêbû, Kurd jî neçar bûn, ku herêmên xwe biparêzin, ji ber wê jî Yekîneyên Parastina Gel wek hêzeke Kurdî hate damezîradin. Di vir de pirsa mezin ew e, hemû aliyên rikberê çekdariya xwe rewa dîtin, û tevan piştgiriya wan hêzên ku her bêlûkek bi dewleteke dervî sînorê Sûriyê ve girêdayî ye kirin, û serê xwe bi wan bilind dikin, belkî ew ji mafê wan be, lê çima dema Kurdan ji bo xweparastinê hêza xwe ragihand çav li wan sor bûn, û ta niha jî şerê vê hêza rewa dikin?

Piraniya wan hêzên çekdar ên ku rikberiyê piştgiriya wan dikirin, û belkî hîn jî, bi dizî dikin, ew bûne yek û nav li xwe kirin Rêxistina Dewleta Îslamî (Da`iş). Ji dêvlî ku ew şerê rêjîmê bikin, wan Kurd ji xwe re kirin armanc û bi hemû kiryarên xwe yên terorîst û hovane êrêş birin ser herêmên Kurdan, û talankirina Kurdan ji xwe re erkekî olî û rewa dîtin. Van çeteyên tundrew û terorîst bi mehan bajarê Kobanê bi hemû çekên giran topbaran kirin, û hemû nîştecihên bajar û gundên Kobanê li dervî sînor bûne penaber. Di dirêjiya şerê Kobanê de, zimanê rikberiyê û di nav de yê Hemahengiya Sûrî jî, lal bû, berçavkên wan tarî bûn û guhên wan jî kerr bûn, ne bûyer didîtin, û ne jî hawar dibîstin. Belkî di bin re li heza wan jî dihat, ku Kurd ji herêmên xwe derkevin û paçereş tê de cî bigrin. Di wê navberê de, hêzên Yekîneyên Parastina Gel Y.P.G - Y.P.J berxwedaneke dîrokî û bê hemapa dikirin.

Dema ji aliyê perlemana Herêma Kurdistanê ve biryar hate dayîn ku Pêşmergeyên qehreman derbasî Kobanê bibin û piştgiriya birayên xwe bikin, serûberê rikbera Sûrî, zimanê wan ji lalbûnê rizgar bû, û şerê wê piştgiriyê kirin. Ango ta hevkariya Kurdan jî, li zora wan tê, û wan çavsor dike. Ma gelo ta kîjan astê rikberiyeke wisa dê cihê baweriya gelê Kurd be???

Dema ku hevbendiya navdewletî bi hêza wê ya ezmanî alîkariya hêzên Kurdî kirin, û navendên Da`işê bombebaran kirin, qêrîn bi piraniya aliyên rikberiyê ket, û nerazibûna xwe nîşan kirin. Ma gelo ew hêvîdar bûn, ku Kurd qir bibin?? Piştî ku çiyayê Kizwanan ji hovên serdema bîst û yekê hate rizgarkirin, û zexta terorîstan ji ser gundên Aşûrî û Kurdan kêm bû, hemû ekranên qenalên ku bi ser rikberiyê ve ne, netebitîn, û her yekê li gor asta kîndariya xwe ji Kurdan re şerê wê serkeftinê kirin. Çima her ku hêza Kurdî li eniyên şer li hember mejîtariyên Da`iş bi ser dikeve, çavên rikberiyê teng dibin, zimanê wan tûj dibe û bi tundî şerê wê dikin??

Di miha Pûşberê de hêzên Kurdî Girê Sipî ji terorîst û tundrewên reş baqij kirin, û bi wê serkeftinê riyek ji riyên locistîk ji ser çeteyên Da`iş hate birîn, û rê di navbera hin herêmên Kurdî de vebû. Vê serkeftinê serûberê rikberiya Sûrî û nemaze ya ku di seyrangeha Stenbolê de bi cîwar bûye, çav li wan sor bûn, û bê dudilî Kurd tewanbar kirin. Ne tenê wisa, lê belê hinan hêzên Kurdî bi terorîstiyê bi nav kirin. Ango bi derew û kîndariya xwe dixwestin yekê li ser Kurdan bigrin. Ma gelo dema ku rêjîma El Be`s pirojeyên xwe yên şoven li ser Kurdan cîbecî dikirin, gund û erdên bav û kalan ji Kurdan distandin û didane Ereban, ev kesên ku îro xwe di refê rikberiyê de dibînin, û bi tundî şerê Kurdan dikin, ew li kû dixebitîn? Ma ne piraniya wan di nav rêjîmê de li ser kursiyên biryarstandinê bûn??

Di van çar salên borî de, tevgera Kurdî ya rêzanî li Sûriyê gelek pirojeyên lihevkirin û yekrêziya navxweyî pêşkêş kirin, û hin ji wan biser ketin wek Encûmena Niştimanî ya Kurdî, lê mixabin hin aliyên Kurdî yên di nav Encûmena Niştimanî ya Sûrî, û di pişt re di Hemahengiya Sûrî de bûn, hertim ling didan ber karê Encûmena Niştimanî ya Kurdî, û di pişt re yê Desteya Bilind, ta ku herdu jî têk birin û herweha Lêvegera Siyasî jî. Ma gelo kî li pişt wê têkbirinê bû, ew li heza kê hat û xizmeta berjewendiyên kê kir???

Ta roja îro jî, hin partiyên Kurdî di bin sîwana Hemahengiya Sûrî de cî girtine, û ew yek ji sedemên nelihevkirina tevgera rêzanî ya Kurdî li Sûriyê ye. Em ji wan jî dipirsin: Ma gelo bersivdayîna pirsên jorîn li cem kê ye??

Dîroka gelê Kurd, û ya tevgera wê ya rêzanî ji her kesekî ve nas e, tucarî şerê tu gel, pêkhate û olan nekiriye. Di dîroka gelê Kurd a nûjen de, Kurdan bi dehan şoreş û serhildan li hember dagîrkerên Kurdistanê vêxistin, lê tucarî kiryarên terorîst û hovane ne di pirogramên wan de hebûn, û ne jî ji sinca Kurdan e, ku dijîtiya mirovan bikin.

Tevlî ev pirsên ku me nîşan dane û hewcedarî ji bersivdayênê re heye, dîsa em dibêjin Kurd ji bo Sûriyeke demokrat ku mafê hemû pêkhateyên wê di destûreke nû de parastî bin dixebitin. Bêguman rêjîma xwînrij ya ku dijîtiya hemû pêkhateyên Sûrî dike dê birûxe. Û tucarî gelê Kurd napejirîne ku tundrewên mejîtarî û li ser serê wan Da`iş û Cebhit El Nusra bibin destlatên Sûriyê, û ta Kurdek hebe em ê herêmên xwe ji wan hovan biparêzin.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Sînem Celadet Bedirxan:

Her Kesê Ku Peyveke Tirkî Bilêv Dike Ez Pênc Hezar Dînar Ji Wan Distînim.

- Ji ber em Kurd bûn, piştî têkçûna beyana 11ê Adarê em ji Kerkûkê derxistin.
-Ttiştê li cem min hemû bi alîkariya Kak Nêçîrvan û Mam Celal hatin çapkirin.
- Zoradriya herî mezin ku dewleta Turkî li me kir, derxistina me ji welat bû.
- Hindek Bedirxanî hene ez naxwazim bikevim nav wan de, ji ber eger bi rastî Kurd in bela bi Kurdî binivîsin.

Hevpeyvîn: Qadir Egîd

- Yadê.. Tu dikarî hindekî ji xwendevanan re li ser kurtejiyana xwe biaxivî?
Guman dikim ku75 sal ne kurtejiyan e. Ez di sala 1938an de li Şamê jidayik bûme. Min dibistana "Rahibata" temam kiriye, dûv re min du sal parêzerî xwendiye, Paşê ez Ji endezyar û nivîskar Selah Se`dela zewicîm û hatim Iraqê. Di sala 2006an de em hatin Kurdistanê. Ji sala 60î ta sala 1970ê em li Kerkûkê bûn, em li çolê bûn ji ber me di parzûngeha neftê de kar dikir, bêtir ji 4 salan ez seroka Yekitiya Jinên Kurdistanê bûm, di sala 72an de li Olam Bator beşdarî Kongirê Jinên Asyewî bûm, sala 73an ez li Mosko beşdarî konfiransa aştiyê bûm, karê me gelek baş bû li Kerkûkê, me guh dida xêzanên şhîdan, imkanatên me baş bûn, piştgiriya me ji gel xelkê bû, ji ber hemû Ereb û Tirkman û Kurd alîkar bûn, û yên kar dikirin bê pere bûn.
ji ber em Kurd in, wê salê em ji wir derxistin, piştî têkçûna beyana 11ê Adarê em ji Kerkûkê derxistin em çûn Bexdayê. Ji sala 80yî de min li dibstana Bexdayê waneyên Ferensî û Ingilîzî, û yên Erebî ji bo kesên biyan yên Netewên Yekbûyî heta sala 1993an didan, Ji 1993 - 1995an ez bûm rêvebira dibstanê, ji 95an de ez karê xwe li malê dikim. rehmetî ferhengek Inglîzî- Kurdî çê dikir, min alîkariya wî dikir. Piştî vê demê em hatin Kurdistanê, min dest bi çapkirina tiştên kevin yên malbatê kir, wek ferhenga bavê min û pirtûkên dî yên kurdî û Giramera Kurdî û Nameya bo Mistefa Kemal. Di sala 2009an de sedsaliya diya min bû, me bîranînek li Hewlêrê jê re lidar xist, niha me elbomek derxistiye hemû resmên Bedirxaniyan in. konê Reş behsek bi latînî nivîsîbû, mixabin li cem min nemaye, dektor Şikriyê Resol behsa jinin kurd tê de dike.
- Te hiqûq jî xwendiye, gello li gor tu jineke mafnas î , tu dibînî jina Kurd gihiştiye mafê xwe?
Rewşa jina Kurd niha Baş e, ne xerab e pêşketî ye, ta ya nexwendevan jî, alîkarî û piştgiriyê dike, ne tenê xwendin giring e, ya giring mejî ye, çi sûd heye eger tu dektora bî û mejiyê te girtî bî?
Lêbelê pêşketinek mezintir jê re divê, dîsan niha jin hene li perlemanê li Kurdistanê, li Bexdayê, belê ez dibêjim gereke dengê xwe bilindtir bikin ji ber em nabihîzin ku li perlemanê yek rabûye giftûgo kiriye û tiştek ji bo jinan xwestiye, ango du-sê jin hene û yên mayî hema rûniştîne. Bila destpê bikin, ne bes bera endamê perleman bin û hew, eger em dixwazin mafê Jinê xurtir bibe divê destpêk ji wan be, ew jinên ku li perleman şûna jinan girtine.
- Tu çawa jina Kurd a ku rahiştiye çekê û berevaniyê di ber axa xwe de dike dibînî?
Ew dest xweş.. keçek ji kampa Domîz hebû alîkariya min di karê malê de dikir, lê niha ew bûye Pêşmerge, ev jî hemû bawerî ye, ne ji bo berjewndiya ye, divê ew welatê xwe rizgar bike..
- Pirojeyek te hebû ku tu erşîfê Bedirxaniyan mîna insklobîdiyekê bide hev, guman dikim te nameyek jî şandibû ji serok Barzanî re di vî derbarî de, ew piroje gihişt ku?
Min dixwest wek ensîklobîdya Bedirxaniyan çêbikim, hemû tiştê wan derxim, lê ev karek mezin e û gelek pere jê re lazim in, divê mirov li dinyayê û li ku derê bûn bigere û erşîf derxîne. Mixabin gelek Bedirxanî emrê Xwedê kirin, em nizanin gorna wan li ku derê ye.
Lê bi rastî ta niha tu tişt çênebûye, ji ber rewş ne xweş e, û ez jî naxwazim behsa tiştin wisa bikim ji ber tiştin giringtir hene divê ku berî insklobîdiyayê pêk werin. Bi rastî ez dibînim ev erşîfê ku li gel min ne yê min e, yê milet e, lazim e were belavkirin û xelk bibînin.
- Pirojeya te bo avakirina dibistanekê bi navê Bedirxaniyan jî hebû, ew çi piroje bû?
Di sala 70ê de rehmetiyê Kamuran hatibû Kurdistanê bo kongira partî, Melle Mistefa Barzanî jî amade bû, û pêşinyarek wisa çêbû ku dibistanekê bi navê Bedirxaniyan vekin, ev jî bidawî nebû ji ber rewş têk çû, û li ser riya wî jî em jî hewl didin ev piroje bighêje serî.
- Ew çi Pirojeya te ya li ser Cezaya Ziman û Xwarinê ye?
pirojeyek min hebû min destpê kiribû, ji ber kurdên me yên Bakur gelekî bi Tirkî xeber didin, min ew ceza dikirin, her kesê ku peyveke Tirkî bilêv bike ez wan ceza dikim, pênc hezar dînar ji wan distînim. cezayek dî jî li gel min ji wan kesên ku xwarina xwe temam nakin re heye, ji ber bêtir ji Milyarekî birçî li jiyanê hene, û xelk li vê derê xwarinê davêjin. Tê bîra min mêvanek min hatibû, ji min re got ji ber ez gelekî li Bakur bi Tirkî diaxivim, ez ê cezaya xwe pêşinde bidim, rabû 100 Dolar da min. û ev piroje berdewam e, ji bo alîkariya hindek xwendevanên me yên ji Rojava û li zankoya Selahidîn dixînin, em alîkariya wan dikin, em gelek cil û bergan didin hev û em belav dikin, ew jî tiştekî serbixwe ye, bi tu rêxistin û saziyan ve ne girêdayî ne.
- Gelek gengeşe li ser pirtûkên Mîr Celadet çêbûn, çi dizî, çi kopîkirin, û gelek nav ketin wê gengeşê de.. Konê Reş, Dilawerê Zingî, Mihemed Uzun, Siyamend Ibrahîm..htd. Gello çima ev gengeşe bi vî awayî çê bûn?
Tiştekî normal e, di nav Kurdên me de û ji bilî Kurdan jî, hene ên ku hez paşgotinan dikin, û nikarin hevalê xwe pêşketî bibînin, lewre wê bibêjin pirtûk dizîne, yan nizanim çi kirine, bes e êdî, bes e, niha hişê deynin ser welatê xwe, hûn çawa dikaribin wî azad bikin. tiştê li cem min hemû bi alîkariya Kak Nêçîrvan û Mam Celal hatin çapkirin. bes e êdî ev gotin şerm e.. Dûv re ji min re behsa Siyamend Birahîm neke, û li ser zimanê min jê re bêje, ew keseke nebaş e, çiku yan tu Kurd î, yan tu ne Kurd î, eger tu Kurd bî alîkarê hevalê xwe be, ne behsa vî û wî bike.
Ez bersivê bêtir nadim, ji ber ku(CD) li ba min heye tê de hevdîtina Mihemed Uzon bi diya min re ye û bes..!
- Hûn çawa rewş û rola rojnamegeriya Kurdî bi giştî û li Kurdistana Başûr bi taybet dinerxînin?
Ez dibêjim kêm û kurtî tê de heye, lêbelê dîsan baş e, em niha rojnameyan bi zimanê xwe derdixin, xwezî jî ev rojname bibin bi tîpên Latînî ji ber ku ta niha bi tîpên Erebî tên deranîn, lê hêdî hêdî çê dibe û li Kurdistana Rojava rojnameya Kurdî baş e, lê gerek em behsa dîroka xwe bikin, ne behsa yekî dî bikin. Her rojnameyek behsa filan û filan ji partiyan dike û di vê çarçoveyê de digerin, ev şerm e, bi taybetî niha gerek bibin yek, ku nebin yek wê sed salê dî jî tiştek bi dest xwe naxin. Ev partî ye û ev nizanim kî ye..! Ev dem ne dema wilo ye, ma em çend milyon in li Rojava? Bera em sê milyon bin. Û çend partî ne? 40 partî ne û her yek çend endamê wan hene?
Divê em dest ji vê rewşê berdin, heger em bixwazin bi rastî tiştek ji me re çê bibe, zor û sitemkariya ku li me hatiye kirin bi destê rêjîma Ba`s bes e.
Bi giştî rojnamegerî hêdî hêdî bi pêş de diçe, navê rojnamegeriya kurdî bilindtir dike, li Bakur rojnamegerî pêşketîtir e, ji ber ew azadtir e.
- Cara yekem ku Yadê çûye Cizîrê kengî bû, û hest çawa tev geryan?
Ez bi çûk bûm bavê min ez dibirim dibistana Rahibata li Ebû Rumanê, bi rê ve ji min re behsa wir dikir, li mal jî her dem behs dikir û digot eger tu mezin bibî em ê herin wê deverê. Di sala 72an de em çûne Istenbolê cem metika min, em bi rê ve li wir rawestiyan, ez giriyam, xortek li wir hebû ji zilamê min pirsî çima ev pîrek digrî, wî got ew neviya Bedirxaniya ye, ji min pirsî tu keça Celadet î, û di deh deqeyan de bêtir ji 50 kesî li dor me kom bûn, û em dawet kirin, min dît eskerên

Tirk çavê wan li ser me ye, min got em rabin çêtir e êrîş werin ser me. min wê carê gelek kêf kir û ez gelek êşiyam jî. cara didwan ez fermî hatim dawetkirin, konfiransekî ziman hebû bi navê" Rûmeta Ziman û Zimanê Rûmetê" bû.
- We çawa mamoste Selh Se`della Nas kir?
dikene… ev raz in..!
Pêwendiyê wî bi diya min û mamê min Kamuran re jî hebûn, ew serokê Komeleya Kurdên Ewrupa bû, û nesîb çêbû, û em hatin Iraqê, Kerkûkê, di sala 80ê de ez li Bexda, li dibistana navdewletî bûm mamoste ta sala 95an, kitêba wî a yekem ji Inglîzî wergerand Kurdî, û pê re peyvên cuda dinivîsandin û wateya wan li rex wan bi Kurdî dinivîsand, dawî ew jî kir Fehengek Kurdî – Inglîzî, kak Mesûd alîkarî pê re kir û ferheng çap kir, paşê instutiya Kurdî li Parîsê ew çap kir, û Ebdella Keskîn jî ew kirin tîpên latînî û çap kir.
- Dayê Malbata Bedirxaniyan ji damezerên yekem di sedsaliya bûrî de tên jimartin. Gelo çima vê malbatê derfeta xwe di rêvebiriya deshilata kurdî de negirtiye, ango stêra Bedixanyan piştî çûna Celadet û Kamuran vemirî?
Bawer nakim hatiye vemirandin, mixabin ta niha, em mezin bûne, me dîrok û mêjûya xwe ya me li dibistanê Ereban, yan Tirkan xwendiye nas nekiriye, lewre ez her dem dibêjim em kî ne ji ku hatine, û ev yek ji nifşên nû re gelek giring e, ez guman dikim gelek tişt giringtir hene diqewimin, anku tu karê xelkê nemaye jibilî behsa malbata Bedirxaniyan bikin, tiştin giringtir di siyasetê de hene.
Eger vemirî be jî Ji ber tu kes pişt bavê min Celadet nema. Lê birayê wî Kamuran Bedirxan di sala 78an de tiştekî gelek mezin li zanîngeha Sorbon li Parîsê çêkir, dest bi dersên Kurdî kir, ev tiştekî gelek mezin e ku li zanîngehek cîhanî wek Sorbon ta niha mamoste hene û dersên Kurdî didin. Gelek Firensiyan li vir dibînim dibêjin me dersên Kurdî ser destê Mîr Kamuran xwendiye. Di salên 60î de ji bo pirsa Kurdî çû Civata Miletan, gelek pirtûk û berhemên wî hene, ferhenga Kurdî -Ferensî çêkiriye. Ew jî gelek tiştên wî hene, ez dibêjim ku ew tişt gerek winda nebin, divê em bikin wek ensîklobîdya ku hemî tiştên Bedirxaniya em deynin tê de. Çima? Ji ber ku ev dîrok e bo militê Kurd ne ji bo Bedirxaniyan e, da ku milet bizane çi kirine, kî ne, kîjan sal e, ew hemî gerek e, da miletê me bizane, mixabin em dîroka Ereban ya Tirkan û ya Firsan dixwînin lê me pirtûkek nîne dîroka me bixwînin.
Yanî ne dîroka Bedirxaniyan e, dîroka Kurdan e, ji ku derê hatin, li ku derê çê bûne, çi qewimiye, çi bûye, erdê wan li ku derê ye, sînorê wan, em cugrafîya Ereban, Tirkan, û Fursan dixwînin, çima me cugrafîya xwe nexwendiye, em bizanin welatê me kîjan in sînorê me kîjan in, mixabin ew tişt ta niha nebûye balkêş ji kesî re, yanî niha li dibistanan çi dixwînin? dîroka Ereban ya Tirkan ya Fursan ya Sefewiyan û Osmaniyan û Silêman Elqanûnî ya Islamiya û Etaturk.
- Bedirxanî hene te bi wan bihîstiye û wan nas nakî?
Pismamek min li Elmanyayê heye bi navê Sefder têkiliyên me hene, neviyên mamê min Sureya li Urdinê ne, niha wek belgefilmekî heye bo danheva Bedirxaniyan (Lem El - şemil), bi rastî hindek bedirxanî hene ez naxwazim bikevim nav wan de, ji ber eger bi rastî Kurd in bela bi Kurdî binivîsin.
- Eger tu karibî ji me re li ser rola mîr Celadet wek şoreşgerekî ne wek rewşenbirekî biaxivî, wek tê nasîn ew çend ezmûnê wî ji bo şoreşekê Li Bakurê Kurdistanê hebûn?
Ew bi xwe li ba min gelek agahî li ser vê mijarê Tune ne, lê ew bi xwe tiştin wilo hebûn wek têkliyên apê min Kamuran bi Mîcer Noêl re, lê ev nabin belgenameyin dîrokî, wek tu dizanî ez mamosta bûm û nabe mirov dîrokê binivîsîne bê awayekî zanyarî.
- Cemşîdê Celadet Bedirxan çima wisa jiyana wî nenas e, cihê xwe di navdariyê de nedîtiye?
Ez naxwazim behsa vê mijarê bikim, ji ber Kurdên me wisa kirin.. di sala 57 di gel Hisên Kîkî Rêxistina Xwendevanên Kurd ava kirin, û dema ku çû Elmanyayê dest bi kar kir, gelek xelk hebûn peyvin bê wate û bê edebî jê re gotin mîna "Tê xwe li ser me bikî mîr û axa" û gelek tiştin dî , wî jî xwe vekişand û got ez ê li vir bibim Dektor û karê xwe bikim.
Merov çi be, eger merov kar ji bo welat neke vala ye, lewre ew jî bû Dektor.
Wî riya xwe bi awayekî dî dîtibû, riya xwe di warê zanistiyê de çêkiribû, jiyana xwe wisa qedand û wexta emrê Xwedê kir temenê wî 60 sal bû, lê kurê wî niha gerek cihê wî bigre, berî demekê li vir bû û ew li Elmanya pijîşk e.
- Neviya Bedirxan Paşa hûnê çawa kilîta Birca Belek bidest xwe bixin?
Temenê min mezin bûye, êdî bila bo xelkên dî bimîne. Baş e, ez di sala 2010an de çûm Cizîrê û ez li wan deveran 4-5 sa`etan geriyam, ew besî min bû.
- Kî ne yên ji hevalên Mîr Celadet û Rewşen tên bîra te, helbet yên navdar, berz û yên ku rola wan ya dîrokî hebû?
Ew gelek, ji wan: Mala Haco û zarokên xwe. Mala Cemîl Paşa, Qedrî Beg û Mihemed Beg, Qedrî Can. Apo Osman, D.Nûridîn Zaza, D.Nafiz Beg D. Nûrî Dêrsimî, min ew dîtine û dan û standin gelek bi wan re hebûn, hevalek wî dî jî hebû li Şamê bi navê Hisên Beg Îbiş.

- Gello navê Mîr Celadet Bedirxan li Kurdistana azad li hin cih, park, û dezgehin fermî bûye, bi tevayî çi ji bo Mîrê zimanê Kurdî li Kurdistana azad bûye?
Tiştekî fermî nebû, bes li Soran dibistanek bi navê " Celadet Bedir Xan" vekirin tiştekî din nîn e.
- We li ser posterê nivîsandîye: Yekîtîya Kurdan bidin min ez ê Kurdistanek azad bidim we".
Hindekî bi cî hatiye, serê sedî pênci,.çimkî hîn sê parçê dî mane, ji bo wilo ez dibêjim serê sedî pênci. Lê bes e em ala xwe dibînin, bi zimanê xwe xeber didin û dixwînin, ev jî tiştek gelek giring e.
- Wateya van gotinan li nik te çi ye?
Kurdistan: Jiyan e.
Azadî: Serbilindayî ye.
Cegerxwîn: Djminê me bû. Ji ber wexta em biçûk bûn Cegerxwîn dihat mala me. Bavê min bang me dikir; werin helbestên wî bixwînin, em biçûk bûn me dixwest em bilîzin. Êdê halê me ji ber Cegerxwîn tune bû. Cegerxwîn helbestvanekî gelek mezin e, û neviyê wî niha zavayê me ye, mêrê biraziya min keça Cemşid e.
Osman Sebrî: Apo Osman dihat mala me. ferhenga bavê min bi dest xetê xwe neqil dikir çimkî bavê min danî bû ser kartona, piştî emrê Xwedê kir Apo Osman her roj dihat mala me dirûnişt destnivîsa wî temam dikir. **Nûridîn Zaza**: Belaya serê me bû. Min her şiqam jê dixwar ya sitar. Nûridîn hevalê me û birayê me yê mezin bû.
- We gelek zordarî ji dest dewleta Tirkî dît, ya herî mezin çi bû?
Derxistina me ji welêt, ev ji hemûyan mezintir bû, em li her çar perçê welêt belav bûn.
- Hûn şoreşa Sûriyayê û rola gelê Kurd û tevgera Kurdê Sûriyayê çawa dixwînin?
Mîr digot: " Yekîtiya kurdan bidin min ez ê Kurdistanek azad bidim we" . anku yekîtî, yekît, yekîtî. Ne yekîtiya hizba " Mam Celal" lêbelê yekîtiya kurdan.
- Dema ku hûn berê xwe didin Sûriyayê, li ku dibin mêvan? Mîratê we wek malbat li Sûriyayê heye?
Dotmamên diya min li Şamê mane. Bavê min û diya min û bavpîrê min yê mezin di taxa Kurdan de veşartî ne. wexta ez diçim wê derê diçim ziyareta wan.

- Gotina te ya dawî bo hemû şopêner û xwedevanan re çi ye?
Ya giring em yek bin û her dem bi zimanê xwe biaxivin, ji ber zimanê me nasnameya me ye. Heger em zimanê xwe winda bikin em ne kurd in û ne tiştek in.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Karîkatorîstê Eyzrebêcanî Gunduz Agayêv

Kawa Şêxê

Hin caran tiştin bala mirov dikşînin û bandorek mezin li ser wî çêdikin.
Dema min karîkatorên ku nîgarvanê Azerbêcanî yê bi navê Gunduz Agayêv resimandine dîtin, pir bala min kişandin û min xwest vî kesî nas bikim.
Dema ku ketin nava rûpelên internêtê de gelek dem ji min xwar da ku min nas kir ku ew ji Azerbêcanê ye û mixabin ku ew ne di Wikipedyayê de ye jî û nizanim ne ku kesekî nû ye niza ji dengvedanê hez nake, hema min ew dît kesekî bêdeng û di xwe de ye..

Lê karên ku Agayên çêdike, hem bi teknîka xwe û hem jî bi mijarên xwe gelekî bala min kişandin..
Ew mijarên gelekî giring bi awayekî şanogerî di karîkatorên xwe de bikar tîne...
yanî li gora ku min ji wî fêm kir ew pirsekê ji xwe dike û bersiva wê bi wêneyan dike..
Wekî mînak, Agayêv ji xwe pirsiye Gelo Heger Xwedawenda dadê ango ya Edaletê dakeve erdê wê rewşa wê li welatên dinyayê çi be an jî ê halê wê ji ber destê serok û rêberên cîhanê çi be?
Gunduz dibêje ku wê xwedawenda Dadê li ber destê Erdogan lêdanê bixwe û wê tundî li ser wê were bikaranîn:

Lê Heger Xwedawenda Edaletê li Sûryê were erdê wê rewşa wê çawa bibe, li ser Sûrî jî Gunduz Agayêv dibêje ku wê Beşar Esed wê tecawiz bike û wê DAIŞ jî serê wê jêke..

Li Rusya wê rewşa Xwedawenda Edaletê jî ne baştir be ji ber ku wê têkeve nava lepên mafya Potîn de

Gunduz Agayêv derbarê Îranê de jî balê dikşîne ser hevkariya di navbera hêzên leşkerî û Oldaran de û jibîr nake ku hemû aliyên Opozisyonê li Îranê di

Li Çînê xwedawenda edaletê neçar e ku bi xebite û bi sedan qapanên sexte çêke da ku ji birçîne nemre..

Li Berazîlê jî tevî feqîrtiyê û belengaziyê lê xwedawenda edaletê bûye beşek ji lîstika gogê..

Li Yonanistanê jî bûye parsek û pereyan pars dike..

Li Emerîka jî bûye balafirek û terorîstan bombebaran dike û bi vê yekî Duzgun balê dikşîne ser tevlîbûna USA ya di nava şerê li dijî DAIŞê de ku tenê jiu Asîmanan de wan bombebaran dike..

Li Ewropa yê xwedawenda Edaletê li gora Duzgun Agayêv bûye mîna jinek ku bêtir wekî serokwezîra Almanyayê xuya dike û barekî giran li ser milê wê ye, barê wê jî helbetê koçber û penaber in..

Li Ezerbîcanê di zindanê de ye

Li Beritanyayê...

Ji Gewîlan Cejna we pîroz be

Idrîs Hiso

Bi hilata rojê re min jî li gel zarokan dest bi cejnê kir. Îro yekemîn roja cejna Qurbanê ye, Zarokên penaber ên Rojavayê Kurdistanê zikak û kolanê kampa Gewîlan ji qerbalixê tijî kirin. Bi her halî û di hemû doxan de zarok dê cejnê bikin.
Ez jî ketim nav zarokan, bi wan re geriyam min cejna wan pîroz kir û li gel wan axvîn. Zarok di roja cejnê de gelekî kêf dikin, lê dema tu nêzî wan dibî, û li gel wan diaxifî, tu di gotin û nerînên çavên wan de hin wêne, hin êş û azarî peyda dikî. Tiştê ku hatiye serê mendalên me tiştekî gewre ye ...lê Dê, Bav û hin xêrxwaz hewlên xwe didin ku ew hinekî kêfê têxin dilê mendalan û wêneyê teqe û bombeyan ji bîra wan hinekî dûr bixin.
Mîna go mendalekî got: "Raste li vir em bê xanî ne, lê vir xweşe..gurmgurim û teqteq tineye wek Sûrî!!"
Aya li bîra me tê ku em pirsên ne asayî ji mendalan bikin. hewil bidin ku tiştê hindirê dilê wan de binasin..... min hin pirs ji mendalan kirin û min xwest ew vê carê biaxifin û ez ji wan fêrbibim û guhdarbikim heger hûn jî dixwazin nasbikin bê wan zarokan çi gotin fermo bixwînin, lê heger hûn naxwazin jî li vir rawestin û ne gereke hûn berdewam bikin.
Qasim mendalekî 10 saliye. Ji Kobanê ye di bersiva çend pirsan de got: "Em berî 6 mehan gihane Gewîlan, Bavê min li Kobanê ye, di cejnê de ez dixwazim ji her kesî re bêjim cejna we pîroz be memnûn..." mi jê pirsî çima bavê te li Kobanê ye got: "Bavê min ŞEHÎD ket... dema em vegeriyan Kobanê piştî DAIŞê jê derket bavê min Avsarik vekir bombeyek bi bavê min ve teqiya ..ez birîndarbûm û bavê min jî şehîd bû....."
Dema min jê pirsî tê veger Kobanê, bê deng ma ... çavên wî ne li vir bûn ..... zimanê wî negeriya lê çavên wî daixifîn.
Lê birayê Qasim ku bi 4 salan jê biçûktire dixwaze dema ku mezin bibe bibe mamoste..... dibêje heta ku DAIŞ hebe ez venagerim Kobanê..... dema min jê pirsî ma kê bombe di mala we de çandin? Got: Beşar Esed bombe di mala me de çandin!!
Ûsama 8 saliye ji Hesekê ye min çend pirs ji wî kirin wî wiha bersiv da: "Cejna bê ez dixwazim li Hesekê bim, Ez mezin bibim ez dê kar bikim, çkar be ez ê bikim...û ez dixwazim bibim rêvebir ... ez dixwazim dibistana me ji wilo baştir bibe."
Hesen 9 saliye ji gundê Enbara ye dibêje: "Em ji ber Ereban reviyan. Ez naxwzim em ji vir herin ... li vir şîk hene û şer jî tineye...ez mezin bibim ez dixwazim kar bikm ...hema çi karbe."
Diyar 9 saliye ji Til Koçer e gulzikek reş û mezin li ber çavê wî bû, dixwaze dewsa konan bibin mal û dibêje: "Ez mezin bibim ez dixwazim bibim Pêşmerge, jiber Pêşmerge DAIŞ dikujin."
Gulbuhar 11 saliye cilên nû li ber xwe kirine û wiha ji kamîreya min re axfî: "Cejin xweş e, ez ji Sûrî me, ez dixwazim şûna konan bikin xanî jiber ku kon dileqin!!."
Dema min ji wê pirsî aya tu dixwaze vegere Sûriyê got: "Na ez naxwazim vegerim ..... Sûrî gurim gurme û teqreqe, şer nema lê dise-kimînim Gewîlan xweşe!!"
Comerd 10 saliye û birayê wî 8 saliye bi cilê Pêşmergeyên Kurdistanê li kolanên kampê digere cilê wî yê mezinane lê kîsê destê wî û sîmayên wî yên zarokane dixwaze bibe pêşmerge jibo ku çekdarên DAIŞê bikuje û got: "Ez mezin bibim ez dixwazim bibim Pêşmerge û vegerim Qamişlo..."
Zarokên penaber li Gewîlan xwedî xewnin. Ceng û şerê welatê wan bandora xwe li xewnên wan kiriye .. hejmrekî mezin ji zarokan dixwazin bibin leşker jibo li dijî têrorê şer bikin .... hêviya min jî ew e bo wan, dema ku ew mezin bibin pêwîstî bi leşkeran nemabe bo şerê li dijî têrorê....ji Gewîlan cejna we pîroz be.

Zêrê Reş

Semîr Sifûk

"Govara "Naşiyonal Enntrast" ya Emrîkî di sala 2013an de diyar kir ku êhtiyatiyê neftê li Rimêlanê nêzî 315 milyar bermîl in, û 69 milyar bermîl heta niha hatine dîtin û derxistin."

Di dema ku devera me di rewşke aloz de derbas dibe, û gelek welatî ji ber rewşeke abûrî û ewlehî koçber dibin ber bi Ewripa yê ve, hin raport li ser rewşa sutemeniyê û pereyên ku rêvebiriya xweser jê werdigre belav dibin.
Raport li ser tora Rûdawê hat pêşkêşkirin û tê de hatiyê eşkerekirin ku nêzî 10 melyon dolar mehane dighê Rêveberiya Xweser nirxê sûtemeniya ku di riya Zemarê re diçe bendera Cîhan li Turkîye.
Ev yek li ser zimanê "Elî Halo" Endamê Komîteya Enercî û Sutemeniyê di parlemantoya Herêma Kurdistana Îraqe de hat eşkerekirin.
Her weha Halo got ku nêzî bîst hezar bermîlên sutemeniyê berhemên bîrên Rimêlanê ne, ew jî rojane ne..!
Di heman demê de Serokê Encumena Wezîran li Herêma Kudistana Îraqê Nîçîrvan Barzanî ji hin alavên ragihandinê re diyar kiribû ku Herêma Kurdistanê alîkariyeke pir mezin bi Rêveberiya Xweser re dike û ne wek tê belavkirin ku Herêm tu alîkariyan bi rêveberiyê re nake. girêdaye mijarê Desteya Enerciyê ya Kantona Cezîrê ragihand ku berhemên xazê ji bîrên xazê yên Kantonê dighe 171 melyon mitir "M4" salê û 7 hezar ton kibrît jî, lê desteyê ta niha eşkere nekiryê bê berhemên bîrê neftê çiqas e, çi yên ku li devera me tên firotin, yan yên ku derdixe dervî Kantonê û tên firotin.?!
Ya giringtir, di baweriya min de sîstema bikaranîna sutemeniyê li Kantona Cezîrê ye..! gelo Rêveberî bi serê xwe tenê dike an têkiliyên wê bi rêjîma Sûrî re hene? yan jî wek hinek nûçe belav bûn ku beşek ji wan berhemên neftê digihe hêzên girêdayî bi serokê Kantona Cezîrê Şêx Himêdî Deham Alhadî!!??.
JI despêka qeyrana Sûriyê û bi taybet ji dema ku hêzên rêjîma Sûrî ji deverên ku neft lê heye, mîna Rimêlan vekişyaye û hêzên girêdayê PYD destê xwe danîn ser wan deveran ta niha ti daxuyaniyek fermî bi berhemên neftê li deverê tune yê. aliyên berpirs eşkere nakin bê pereyên ku ji froştina neftê bi ci şêweyê belav dibin yan jî karmendên ku kar dikin ên rêjîmê ne yan ên rêveberiyê ne?
Ev mijara ku rêjîma Sûrî jî ti zaniyariyên zêde li ser nedidan, lê piştî raporta Rûdawê erkê li ser Rêveberiya Xweser ku ji raya giştî re eşkere bike, bê ta çi radeyê nûçeyên ku belav dibin di vê mijarê de rast in yan na!? Li aliyê din ta niha Encumena Zagonsaz ya Rêveberiya Xwser di civatê xwe de li ser vê mijarê ti guftugo nekirine.!!? tenê yasayek ji bo berhînana sutemeniyê ji hêla kompanîyên taybet li deverê û ta niha ji bilî kompaniya "Cezîrê" ya girêdayî bi Rêveberiya Xweser ve ew jî mîna kompaniya "Sadkob" a rêjîmê ye, ti kompaniyên din kar nekirine.
Ev yek gelek pirsan li cem welatiyan dihêle û metirsiyek mezin çêdike ku sîstem her ew sîstema rêjîma sûrî be di warê bikaranîna neftê de yan di pereyên ku jê tên wergirtin
hêjaye gotinê ku Govara "Naşiyonal Enntrast" ya Emerîkî di sala 2013an de diyar kir ku êhtiyatiyê neftê li Rimêlanê nêzî 315 milyar bermîl in, û 69 milyar bermîl heta niha hatine dîtin û derxistin. Ev tişta ku hîn di binê 'erda Rimêlanê de mayî têra welatê Sûriyê hetanî 18 salên din dike..!! Helbet li gor ku wê rojnameya Emerîkê di lêkolîna xwe de behs kirî!.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Hesen Hişyarê Serdî (1907-1985) (Jiyan, Tekoşîn û Berhem)

*Dilawerê Zengî**

"Millet'im Rabe Binêre Îro Çaxê Xweserî
Kes Ji Te Pê Ve Nemaye, Dîl û Jar û Bê Serî
Mane Şerm e, Em Tenê Mane Di Bin Destê Neyar
Ta Bi Kengî Wer Bimînin, Ew Şivan û Em Kerî"

Hesen.Hişyar. Serdî

Hesen Hişyar kurê Mustefayê hecî Umer e, ji Kurdistana Bakur, ji wilayeta (Diyarbekir an Reş Amed) qeza (Hênê) ji gundê (Serdê) ji malbat û barîxa wan re (Sadîqan) tê gotin, ku ji êla (Zerikan) e.

Di sala 1907 an de, li wî gundê bav û bapîrên xwe, hatiye dinê. Zarotiya xwe, wek hemû zarokên gundan piştî ku temenê wî bûye heft salî, li ber destê melê gund (Hadî Emîn) qurana pîroz xwendiye. Piştî mirina bavê wî, diya wî (bixwe Zazî ye) wî dişîne gundê xalê wî (Derqam), li wir li ber destê xalê xwe şêx Ehmed hînî çend pirtûkên olî bûye. Piştî ku bîrwer dibe, li ber destê mamostakî penaber (Muhacir) bi navê (Haşim) sê salan xwendiye û serwextî gelek tiştên nuh bûye.

Di dema cenga cîhanê ya pêşîn de (1914-1918). Pireya bûyerên wê cengê tên bîra wî nemaze pergala birçîbûnê, nexweşiyê û penaberiyê (Muhaciriyê). Giraniya şer ketibû Kurdistanê ku hingê enî tuxûbê Qersê bû. Piştî salekê leşkerên Osmanî berupaş ve dikişiyan, roj bi roj eniya şer bi şûn de vedigeriyan, heya ku enî kete (Erzerum, Wan, Bedlîs, Artevîn û Mûş) Kurdên van hawîran tev de welat berdan û penaber dibûn.

pergala eniya şer li (deşta Parsîn, Erzerum û Hesen Qela) pir nexweş bû. Ev qad, li tuxûbê Kurdistana Bakur û ûris dikeve. Gundê Hesen Hişyar û malbata wî, li dora not mal bûn, çel û heşt peya çûn wî şerê mirovxwer, yek ji wan venegeriya. Di wî şerî de, leşker di nav berfê de, bê çek û xwarin tev de, ji ber sipî û nexweşiyan qir dibûn. Rewşa Kurdan û welatê wan Kurdistanê pir dijwar bibû.

Di 16/5/1916-an de û di riya van her sî dewletên mezin Rûsiya, Birîtanya û Ferensayê re û bi navînkirina -peymana reş –Saykis Bîko -, Bakurî Kurdistanê giha Turkiya, Başûrî Kurdistanê giha Îraqa nuh, Rojavayê Kurdistanê giha Sûriya û ji xwe Rojhilat tev di bin destê Îranê de ma.

Piştî rûxandina dewleta Osmanî, Kurdan derfet û nîreke nuh di derbirîn û çareserkirina pirsa xwe de dîtin. Nemaze di danezana rêbaza Wilson ya çarde xal de; ji bo mafên miletan bi azadî û serxwebûnê bê çespandin. Lê mexabin biryarên Sêvirê, li kongira Lozanê 23.07.1923-an binpê kirin, û hevkaran soz û peymanên xwe bi Kurd û Kurdistanê re xwarin.

Piştî têkçûna peymana Sêferê û îmzekirina Peymana Lozanê, di 29-ê Cotmeha 1923-an de, Komara Tirkiyê tê çespandin. Hebûna Kurdan tê tunekirin. Li ser vê yekê, hinek serbaz, axa, beg, şêx û rewşenbîrên Kurd li Erzerumê di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de, bi navê (Komîteya Îstîqlala Kurdîstanê) yan jî tevgera (Azadî) rêxistineke siyasî dadimezirînin. Di Çiriya Paşîn sala 1924-an de, ji nişka ve Xalid Beg û nûnerê BedlîsêÛsif Ziya herdû hatin girtin, birin Bedlîsê bê pirs û bersiv herdû bidar vekirin. Ev rêxistin, bingeha pêxistina agirê şoreşa Şêx Seîdê Pîran 1925-an bû.

Bi vêxistina agirê şoreşa Şêx Seîdê Pîran re, Hesen Hişyar tevlî wê serhildanê dibe û bi hestekî neteweyî û bi ramaneke azadîxwaz, di teqîna gula pêşî ji şoreşê tifingê hildigre û tevlî refê şervanên azadiyê dibe. Di gelek eniyên cengê de, berevaniyekê lehengî û mezin dike. Di nava agirê şer û cengê de, nexweşî, dijwarî, xinizî, mêranî, qehremanî, cangorî û pakrewanî tev bi çavên serê xwe dîtiye. Lê, ewî newqa xwe ji dijmin re vala nekiriye û bi lehengî û liberxwedanî şer kiriye. piştî şoreş têk çû, rêjîma Atatuk dest bi girtinê kir. li her devrê welat destpê kirin, li gorî awirên wan sûc bêsûc her kes digirtin. Ewçend ku ji zindanan pê ve mizgeft û dêr jî dagirtin.

Hesen Hişyar jî, ji wan girtinan bêpar nema, ew jî hate girtin. Li ber dadgeha leşkerî bi darvekirinê hate ferwerîkirin. Lê, ji ber temenê wî biçûk bû, panzde salan arih kirin. di nav van zindanan de (Diyar Bekir-Xarpêt- Qeyserî û Nigde), li dora sê sal û nîvan girtî maye, paşê ew jî dikeve ber biryara riha, ya ko di sala 1928-an de derket û ew vegeriya welêt. Piştî bûriya giştî, diçe bajarê Diyar Bekirê wek kargêrê cergeya tabûya Qulpê li ba dewletê kar dike. Di sala 1930-î de, bi geşkirina agirê şoreşa Sasûn û Araratê re rêjîma Turk kesên bi guman digirtin, nemaze yên berê hatibûn arihkirin. Dîsa Hesen Hişyar giha refên şervanên azadiyê. Piştî mayîna sê salan li serê çiyan, ku ji Licê heya Xarpêt û Bîngolê digel du hezar şervanî. bi şev û roj ji bo piştgiriya Araratê bi dijmin re şer dikir. Şoreşa Araratê têk çû ew û çar peya dadikevin Binya Xetê-Cizîrê.

Di sala 1934-an de, ew û du pismam û birakî xwe bi du gulan birîndar daketin Cizîrê, li bajarê Amûdê, bi cihûwar bûne. Ji ber rewşa bêkarî, zîvarî û belengaziyê, di riya Qedûr Beg re li gundê (Rihîkê) li nav êla Milan, ku dikeve navbera Amûdê û Dirbêsiyê demekê dimînin. Ji neçarî, ji wir jî bar dike û diçe gundê (Eyîn Qirdê) sê salan li wir cotkarî dike. Dîsa ji wir jî bar dike û diçe (Senceqê)- dikeve qubleyê Amûdê-. Di sala 1938-an de, li gundê (Senceqê) dibistanek ji bo hînkirina zimanê Kurdî vedike. Piştî salekê ji vekirina wê dibistanê, bi destê Firensizan hatiye girtin. Piştî şeş salan ji jiyana cotkarî û gundîtî, bi malbatî, di sala 1940-î de, dîsa vedigere, li bajarê Amûdê bi cî dibe. Li bajarê Amûdê dukanek fatoran vedike. Di wê demê de, bajarê Amûdê navenda çand û wêjeya Kurdî bû. Bi saya serê gelek welatparêz û gelperwerên mîna: Reşîdê Kurd, Mele EvdulHadî, Cegerxwîn, Qedrî can, Ûsê Hersan, Mihemed Elî Şiwêş, şêx Selîm, Nûredîn Zaza, Şêx Beşîr, Ehmed Nafiz, Tirêj û Hesen Hişyar.... HT.. bajarê Amûdê qublegeha welatparêz û şervanên azadiyê bû. Hingê kovar û rojnameyên Kurdî pir dihatin çapkirin û belavkirin mîna: (Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr), belavokên civata Xoybûnê û hin kovar û rojnameyên ku bi zimanê erebî dihatin weşandin mîna: (Wijdan û Huriyê) .. HT. Li herêma Amûdê û derdora wê abone û kiryariya wan kovar û rojnameyan tev di riya Hesen Hişyar re bûn. Ji milê dî ve, nivîskarên van kovaran, di riya wî re nivîsandinên xwe rê dikirin û berhemên wan dihatin weşandin. Dukana wî bibû wargeha xortan, bibû hêlîna fêrkirin û danûstendina li ser zimanê Kurdî, bibû navenda her mirovekî welathez û gelparêzan. Ew bixwe, di wan kovar û rojnameyan de dinivisand û bi herdû zimanan Kurdî û Erebî berhemên xwe belav dikir.

Hêjayî gotinê ye, di wê demê de, bajarê Amûdê navenda zana û zanyarên olî yên gewre û mezin bû mîna: Şêx Mihemdê Moza, Mele Ebdulletîf, Mele Fethulla, Mele Ebdulhelîm, şêx Beşîr Elhamidî, şêx Ubêdê şêx Zahir, şêx Ehmedê Kesk, şêx Ebdulmecîdê Huseynî, şêx Efîf û şêx Selîmê Huseynî....HT.

Di navbera salên 1953-1957-an de, têkilî û danûstendinên Hesen Hişyar bi rojnameya Wijdan û Huriyê re hebûn.

Di sala 1956-an de li bajarê Helebê Hesen Hişyar û çend hevalên xwe civatek bi navê (Komela Zanistî û Alîkarî a Kurd) pêk anîn.

Damezrênerên komelê: Dr. Nûrî Dêrsimî, Rewşen Bedirxan, Hesen Hişyar, Osman Efendî û Heyder Heyder. Armanca komelê; pêşxistina ziman, tore û dîroka gelê Kurd bû. Mexabin pir dirêj nekir. Li dora du salan (1956-1958) tenê berdewam kir. Lê pir çalakiyên hêja kirin. Damezrênerê komelê Hesen Hişyar di destnivîsên xwe de dibêje:

- " Bi doza Kurd ve me (18) rûpel nivîsarek li Misrê bi destê Mihemed Hilmî Beg da kongirisa (Bandok)".
- " Ji bona şoreşa (Ciwanrû yên Kurdên Îranê) me (protustokî) bi navê (Jenosît) bi zimanê (Erebî, Turkî, Farisî û Firansewî) dijî (şah) da belavkirin".

-" Bi (Partiya Eyoka ya Qubrisî) re, me hevalbendî girêda, her buyerên wan me di rojnama xwe de didane belavkirin, ji ber ku ew jî dijî dewleta Turk û Ingilîz bûn. Çawa ku meseleyên Kurd jî li (Atîno) serekê diyaneta Islamî (Hafiz Elî Reşad) werdigerandin zimanê (Yûnanî) û di rojnameyên wan de didane belavkirin".

-" Li (Beyrûtê) di rojnameyên Erebî de li ser Kurd û Kurdistanê di rojnameya (Wiedan- Huriyet) de didane belavkirin".

Evê komelê gelek pertûk dane çapkirin û belavkirin. Ji wan pertûkan:

- El-red `ele kosmopolîtiye – Hesenên Şiniwî.(Bi zimanê Erebî).
- Kîfah El-ekrad – Samid El-Kurdistanî.(Bi zimanê Erebî).
- Dêrsim di tarîxa Kurdsitanê de- Dr. Nûrî Dêrsimî.(Bi zimanê Turkî).

Diyar e, kar û çalakiyên vê komelê ji temenê wê pirtir bû. Bi temenekî kin, ku du salan bi tenê dirêj kir, xebatin berfireh ji gelê xwe re kir. Evê komelê -mîna komelên din- piştî damezirandina Partiya Demoqrat ya Kurdistanê, ew ê jî xwe hel kir.

Di sala 1962-an de, ji bajarê Amûdê berî dide bajarê Qamişlo, li wir, bi cî dibe, ta ku ji nav me bar dike.

Di sala 1966-an de, kovara AGAHÎ , bi destê ronakbîrê gewre Hesen Hişyar derket. Di rûpelê pêşîn de hatiye nivîsandin: (Kovarek(e) zanistî, toreyî, tarîxî û siyasî ye). Kovar, li parêzgeha Hisiça, bajarê Qamişlo derdiket. Ji alî tîp û gewdê kovarê 20X40 s.m-ye. Rûpelên wê ji (15-33) rûpelan hevedûdanîye. Ji ber rewşa ramyarî xwediyê kovarê kovara xwe li tilnivîsê dida û bi hejmareke hindik û bi awayekî veşartî belav dikir. Ne tenê barê xercî û belavkirina kovarê li ser milê xwediyê kovarê bû, belê nivîsandin û amadekirina wê jî jê dihat xwestin. Kovar di nîrek pir dijwar de derdiket. Lewre tu demek diyar ji derketina wê re nebû. Hejmarên vê kovarê gihane nozde hejmaran. Naveroka kovarê pirtir ramyarî û dîrokî bû. Xwediyê kovarê nerîn, dîtin û bîrûbaweriyên xwe di riya vê kovarê re dida belavkirin. Hin caran bûyerên Kurd û Kurdistanê belav dikir.

Di kovarê de du helbest û nameyek bi tenê ne yên xwediyê kovarê ne. Helbestek ya nemir Ehmedê Palo û ya din ya nemir Hemzayê Muksî ye. Name jî ya Prof- Qenatê Kurdo ye, ya ko di sala 1956-an de ji komela Zanistî û alîkarî a Kurd re rêkiribû. Qenatê Kurdo di wê nameya xwe de dibêje: (Gelî biran ji wê xebata we re sipas dikim, eger çiqasî dijwarî bikevin pêşiya we jî divê hûn zêdetir navê Kurd û Kurdistanê di roznaman, kovaran û her nivîsarên piçûk û mezin de bidin belav kirin. Em di esra bîstî de ne esra ronahî û atomî de ne. Îro miletên bêdeng zû asîmîlasyon dibin, heya zarok negiriyê dê bi wê dilovaniya xwe şîr nade wî an wê....).

Xwediyê kovarê daxwaz û sedemên derketina kovara xwe dide diyarkirin û dibêje:

(Daxwaz ji vê kovara veşartî û destnivîs: Herwekî ji zanan re qenc agahe ku li gor rêzan û heqnenasiya Rojhelatê Navîn dewletên Kurdistan vegirtî, xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî gunehkariyek ji kiryariya (muxederatan) gelek mezintir û dijwartir e...).(Nemaze Kurdên Sûrî ji (1958)an de, di giriftariyên dijwar de hatine girêdan... di her awayên teqalîdên xwe ên qewmî û civatî de pêçandî mane! Çewa ku her nîştimanperwerên ji hev dûr nikarin bi serbestî û hêsanî bigîne hev û serpêhatiyên tê de, ji hev re bidin zanîn û li ser çaredîtinan heş û agahiyan bi hev biguhêrin..!). (Ji ber wan bûyerên zeman û mekan di armanca xebatê de ji bo agahdariya hin nîştimanperwer li gor pêkanînê min xwe berpirsiyar dît. Da ko nûçe û bûyerên der û hundir ên ku doseya Kurdistan, di xwe de digre ji wan re bişînim. Lewre rojên teng û tarî nêçîrê tarîxê ne).

Xwedî û berpirsiyarê kovarê li ser vê bingehê kovara xwe derdixist û raman û baweriyên xwe dida belavkirin. Bi giyanekî gewre û ramanekî bîrewer pêwîstiya yekîtiya tevgera Kurdî dide diyarkirin. Bi xurtî şerê perçebûn û jihevketina tevgera Kurdî dike, dibêje: (Çep û rast herdû milên laşekî ne, laş ku nebe kîjan milê çep û rast!!??).

Xwediyê kovarê mîna bijîşkekî pespor destê xwe datîne ser birîna nesaxiya tevgera Kurdî, ya ku sedema ji hevketin û bindestiya gelê Kurd e, bi zanîn diyar dike û çare û derman jê re dibîne. Ew çare û derman yekîtiya tevgera Kurdî ye.

Hesen Hişyarê Serdî gencîneyek devgirtî ye. Dîrokvan, helbestvan, rojnamevan û tekoşerekî gernas û navdar e. Di kûrahiya heşt hezar sal berî zayînê de, li ser dîroka kevnareya şaristaniya gelê xwe nivîsandiye û bi belge çespandiye. Nijadê Kurd bi kok û rehên wê yên dîrokî, li ser xaka bav û bapîran vejandiye û bi awayekî zanistî xelekên dîrokê, bi hev girêdaye û li ber çavan raxistiye. Gelek caran bi awayekî zanyarî nerîn û dîtinên xwe bi şehekî taybet dihûne.

Ew bixwe dibêje: (Çima ji tarîxê re tê gotin: Muqedes?. Ji ber ku salix ji wan insanên zemanên bûriyên dûr ve dide, her tevgerên jiyîn û serpêhatiyên wan bi wî zeman û mekanî ve girêdayî bixwe digre, wê rewş û her awayê wan ên civatî, abûrî, dezgedarî, zanistî û siyasî ku ji wan bi şûn de wek: Sî an rêça wana mayî di zemanê îro de ji me re dide derpêşkirin, ku ji muerix re muhendisê zeman û mekan tê gotin û ji paraztina mentiqa tarîxê re pîroz tê gotin).

Dîsa gotin ya ronakbîrê gewre Hesen Hişyar e: (Bi wê agahiyê divê em zanibin dema ku bixwazin zanibin ku tarîx ne pêgirtiyê nizam û qanûnên dewleta ne, wiharenge ne pêgirtiyê pirogiramên partiyên çep û rast û ne jî bi (felsefeyên rûhî û madî) ve jî girêdayî ye, ji ber ku ew tev de li ber mirêka tarîxê ne, ne tarîx ji ronahiya wan pêk tê no, felsefe di tecariban de xwe bi tarîxê digre. Em siya tarîxê û tarîx siya zeman e, ew zemanê ku ji xwe ye, bixwe ye û li xwe ye, her peyda ji zemanin lê zeman her ji xwe ye jê re pêşî û dawî nîne her tişt ji ve ne û pêvena, bê zeman îlmê felekiyat, riyaziyat û fîza jî nikare qiyas û nisbet bigre).

Hesen Hişyar bi dûrbîneke pir hûr, kûr û zelal sedemên her serpêhatî û bûyerekê dîtî û jiyayî bi nav û nîşan rave dike. Ji peymanên navdewletî û sozên hevkaran û xapandina Kurdan û parçekirina Kurdistanê û sînorên çêkirî bigre, ta bi xinizî, xapandin, nakokî û bêbextiya axa, beg, şêx û nezanên Kurdan re derkeve, bi zelalî ta bi derzî vedike.

Em dikarin bibêjin seydayê gewre Hesen Hişyar dîdarê li ser hemû bûyerên dema xwe bû.

Seydayê gewre pir helbestên hêja û ciwan ji bo hişyarî û geşkirina hestê neteweyî nivisandiye. Helbestên xwe bi awayekî kilasîk, bi pêlewaz û terazû hûnandiye. Naveroka wan li ser welatparêzî û berxwedanê ye. Xwediyê pirtûkekê li ser urûda Kurdî ye. Gelek gotar û nivîsandinên wî di warê siyasî û ramanîyê de hebûn. Mirovekî siyasetvan bû. Xwediyê ezmûn û serpêhatîyan bû. Hesen Hişyar bi sê zimanan (Erebî, Farisî û Turkî) dizanî bû. Nivîskarê her sê kovarên navdar (Hawar, Ronahî û Roja Nû) bû. Seydayê Tirêj demekê li ber destê mamoste Hesen Hişyar fêrî zimanê Farisî bûye. Hesen Hişyar nav li seydayê (Tirêj) kiriye û ji wê rojê de, seyda bi vî navî di nava gel de tê naskirin.

Hêjayî gotinê ye Hesen Hişyarê Serdî pênc law û heşt keçên wî hebûn navên wan ev in:

Law: Selahedîn, Mustefa, Gorgîn, kesra, kamîran.

Keç: Perwîn, Gulistan, Gewher, Jale, Hêvîn, şêrîn, şevîn, şehban.

Berhemên seyda ev in:

-Pênc cild " dîroka Kurd ji (8000) sal berî zayînê heyanî qirnê (19)-an".

-Pênc cild " dîtin û bîrhatinên min ji (1914-1984)" bixwe digrin.

Sed heyf û mexabin ku hemû berhemên wî destnivîsin, nehatine çapkirin, ji bilî cildê yekemîn ji (dîtin û bîrhatinên min) ew jî, bi destê min, li libnan- Beyrût, çapxana Emîral, di sala 1993-an de hatiye çapkirin.

-Dîwanek ji helbestan.

-Zerdeşt û Newroz Bûza û Konfîçyos.

-Felsefa xebata welat.

-Gazî û hawara navbera Zagros û Zara- kirasekî ye.

-Urûda Kurdî ji bo helbestan.

-Nozde jimarên kovara Agahî.

-Deh muzakeratên ku min dane şoreşa Îraqê.

-Muzakeratên (Qedrî beg) min wergerandiye zimanê Kurdî.

-Şoreşa şêx Seîd û Araratê.

-Kirasê sipî û destê reş.

Ronakbîr, siyasetvan, dîrokzan, helbestvan û tekoşerê gewre, di 14-ê Êlonê sala 1985-an de, ji nav me koç kiriye û li Dugirê hatiye veşartin. Hezar dilovanî li giyanê wî bibare û cihê wî buhişt be.

Jêder û çavkanî:

- Hesen Hişyar,(Dîtin û Bîrhatinên min) cildê yekemîn, li libnan-Beyrût, çapxana Emîral, di sala 1993-an de, bi destê min hatiye çapkirin.
-Kovara AGAHÎ- Rûpel:2. Hejmar:3. Sal:1969.
-Kovara AGAHÎ- Rûpel:10. Hejmar:15. Sal:1980.
-Kovara AGAHÎ-Rûpel: 11.Hejmar:16 . sal:1981.

Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya

Hesen Hişyar di qewêtiya xwe de, ya ku di 25-ê Hezêranê 1984-an de, ji zarokên xwe re nivisandiye, dîroka bûyîna xwe (1907)-an dide diyarkirin. Ez bawer im wê ev ya rast be.Di hin destnivîsên wî de, bûyîna xwe di sala (1905)-an de nivisandiye, ez bawer im wê ev şaş be, ji ber ku (li ser gotina wî) dema şoreşa şêx Seîd 1925-an de tê girtin û ji ber biçûkbûna temenê wî biryara bidarvekirinê lênakeve, ew tenê 15 salan ferwerî dikin.

Ji bo agahiyên li ser kovara (AGAHÎ) yên ku heta niha hatine belav kirin, digel wêneya bergê kovarê, ku ji alî gelek nivîskar û rewşenbîrên me bikar anîne , tu kesî çavkanî û jêderê wê negotine û nedane xuya kirin. Ji ber ko tu kesî berî min li ser vê kovarê nenivisandiye. Ev jî cihê mixabiniyê ye.